



# Xizmetên Piştevaniya ji Cih-guhertina Xortan

## GUHERTINA XIZMETAN JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'ê

Raberkirina Xizmetên Piştevaniya ji Cih-guhertina Xortan (Youth Transition Support) di serdema belavbûna KOVÎD-19'ê da hema wisa jibo seredaneran pêkan e. Tevî vê yekê, gengaz e ku şewaza raberkirina xizmetan li gorî şîretên fermî yên Tendurustiyê were guhertin.

Niha dewsa lidarxistina civînên amadeyî an komkî, têkilliya kesane digel seredaneran bi riya telefonê va pêk tê û raberkir xebata komkî bi riya Plaformên cûrbecûr ên Torên Civakî ji wan 'Zoom', 'WhatsApp' û Facebook'ê cih tînin.

Raberkirên xizmetan jibo seredanerên ku zimanê Inglîzî bi başî xeber nadin, ji xizmetên wergerandina devkî ya telefonî sûdê werdigirin.

Derbarê **KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahiyên bi dest bîne.**

## Xizmetên Piştevaniya ji Cih-guhertina Xortan (YTS) çî ye?

Xizmetên YTS'ê alîkariya xortên ku bi riya Vîzara Mirovdostane hatine û koçberên li ber zîyanê ku temenê wan navbera 15 heta 25 salî ye, dike ku kar bikin û perwerdehiya xwe bişopînin, amadehiya xwe ya karî jorda bibin, derfetên karî bi dest bixin û têkiliyên civakî yên xort bi riya fêrkarî û danûstandinên sporê pêk bînin.

Renge xortên ku bi riya Vîzaya Mirovdostane va hatine û koçberên din di warê bidestxistina xizmetên piştgiriye, şopandina riya daxwazên fêrkariyê û tesbîtkirin û seqamgîrkirina karkirina xwe tûşî hin kêşeyan bibin û pirranî jibo pêkanîna û parastina têkilliya xwe tev civaka nû hewcetî bi alîkarî û piştevaniya zêdetir hene.

Ev yek renga ji ber berbendên zimanî û çandî an nebûna şebekeyên hertimî û zanyariyên li ser bazara kar a xwecihî be.

Malbatên xortan jî renga tûşî mijarên têkildarî hesta girêdayîbûn (te'elûq) û têkiliyên civakî bin.

Xizmetên YTS'ê bi riya bereyeke berfireh ji proje û çalakiyan ji wan alîkariya bo xortan jibo têkildanîna digel xizmetên karkirina xwecihî û Şolan, û perwerdehiya profesiyonê û perwerdehiyên din, bo wan were raberkirin.

## Xizmetên YTS'ê çawa dikare alîkariya xortan bike?

Xizmetên YTS'ê jibo pêkanîna şîyan û guhêrbariyê li nav xortên ku bi riya Vîzaya Mirovdostane hatine Australyayê û koçberên din ên xwedan merc alîkariyê dike da ku dewama perwerdehî û karê xwe bi awayekî serketî bişopînin.

Xizmetên YTS'ê bala xwe dide ser çar babetên girîng. Ev babet pêk hatine ji:

- Beşdarî di karkirinê da bi mebesta baştirkirina amadetiya karî ya xortan.
- Têkilliya qahê û xurt digel beşa fêrkarî û perwerdehiyê bi mebesta piştewaniya ji xortan jibo parastina têkilliya wan digel beşa fêrkariyê.
- Derfetên karî jibo alîkariya bo xortan bona wergirtina pisportiyên xwe yê profesiyonal û xurtkirina wan.
- Beşdariya sporê jibo alîkariya bo xortan di pêkanîna têkilliyên civakî û xwebaweriyê bi riya bernameyên sporê.

## Gelo ez xwedan-mercê wergirtina van xizmetan im?

Heke temenê te ji 15 heta 25 salî ye û te destûra mayîna hertimî heye û di 5 salên bihurî da bi riya Vîzaya Mirovdostane derbasî Australyayê bûyî û anjî koçberêkî pêvajoya malbatî bi serdestiya kêr li ser zimanê Inglîzî yî, ev gengazî heye ku te mercên pêwîst jibo wergirtina xizmetên YTS'ê hebin.

## Ez çawa dikarim xizmetên YTS'ê bi dest bixim?

Di xiştêya jêrê da, raberkirên xizmetê ku xizmetên YTS'ê raber dikin, hatine nivîsandin. Heke tu hez dikî ku di bernameyê da beşdar bibî, ji kerema xwe digel raberkira xizmetan ya li navçeya xwe bikeve têkilliyê.

Raberkirî Xizmetan	Xizmetên YTS'ê li navçeyên jêrê pêkan in
Civata Misilmanên Libnanê (Lebanese Muslim Association)	Canterbury, Bankstown, Liverpool and Fairfield, NSW
Navenda Çavkaniyên Koçberên Komî (Community Migrant Resource Centre Inc) (Parramatta)	Auburn and Blacktown, NSW
Australyaya Pirr-Çandî (Multicultural Australia)	Brisbane, QLD
Kompaniya Xizmeta Civakî ya Eksêse (Access Community Services Limited)	Logan, QLD
Kompaniya Binyata Vîktoriya Jibo Işkencedîtiyan (Victorian Foundation for Survivors of Torture Inc) (Foundation House)	Greater Dandenong, Casey, Hume, Brimbank, Darebin, Maribyrnong, Melbourne and Whitehorse, VIC
Civata Biratiyê ya Sent Larêns (Brotherhood of St Laurence)	Hume, VIC